

## Civîna Cizîra Botan

Civîna Kurmancî ya 54an, rojên di navbera 21 – 28ê meha hezîrana 2014an de, li bajarê Cizîra dîrokî hat li dar xistin.

Cizîr wek bajar roleke girîng di dîroka Kurdistanê de ditiye. Demeke dûr û dirêj bûye paytextê mîrektîya Botan ku yek ji sê mîrektîyên herî xurt, temendirêj û xwedanroleke mezin ya serdema piştî Eyûbîyan e. Desthilatdariya vî mîrektîyê heta nivê sedsala 19an dom kiriye û piştî tevgera merkezîkirina desthilatdariya osmanîyan bi awayekî pir hovane dawî li jiyana van mîrektîyan hat anîn. Yeknebûna mîrektîyên kurdan, jêkdûrî û tenaqûzên di navbera mîrektî û eşîretên kurdan, ji hest û hişyariya neteweyî dûrbûna wan, kir ku osmanî di planên xwe de bi ser bikevin. Kurdistanê di bin destên osmaniyan de têxin bin zept û reptekê, rê nedîn serhildan û daxwazên neteweyî yên kurdan.

Mîrektîya Botan û Cizîr ne bi tenê di warê dîrokî de, lê belê di warê pêşdebirina çand û edebiyata kurdî de jî roleke mezin listiye. Nemaze bi rêya Medreseya Sor û Medreseya Mîr Evdal, Medreseya Finikê xwendineke dînî û zanistî hatiye bi rê ve birin. Bi hezaran mela û feqî, bi dehan zanyar û edibên kurd ji perwerdeya wan derçûne, xizmet dane gelê xwe û di ronahîkirina gelê xwe de bi karekî hêja rabûne. Bi taybetî di warê zimanê kurdî ya edebî de hîmeke qayîm danîne û bûne rêberên standartkirina zimanê kurdî ya edebiyata klasîk.

Derçûyên van medreseyan, dersdar û dersbêjên wan, hîmên edebiyata kurdî ya klasîk danîne û bûne sedemên afirandineke dewlemend ya zimanê nivîskî ya bilind. Mela, feqî û xwendekarên wan, yên ji herêm û hêlên cuda cuda yên Kurdistanê, bi rêya van medre-

seyan ji devoka xwe bi dîr ketine û devoka Cizîra Botan jî xwe re wek bingeha zimanê nivîskî yê kurdî (zaravayê kurmancî) pejirandine. Edebîyateke di ast û deraxa zimanên rojhilatî de, wek farisî, erebî, osmanî/tirkî, afirandine û ji wan paşdetir nemane. Ji ber vê ye ku em kurd bi edîb û zanyarên xwe yên wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Elîyê Herîrî, Elîyê Teremaxî, Melayê Bateyî, Feqîyê Teyran, Sîyahpûş, Mûradê Bazîdî, Îsmailê Bazîdî, Şêx Nûredîn û Şêx Memdûhê Birîfkanî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Mela Xelîlê Sêrtê, Pertew Begê Hekarî, Îbn-ul-Esîr, Ebu-l-Îz, Seîdê Kurdî, Axayok, Evdîrehmanê Axtepî û hwd bêhed serbilind in û herweha deyndar û qerzdarên wan in. Divê em timî jî wan re daxwazkarê rehmê bin.

Di vî civînê de li ser van babetan hat kar kirin: Peyvên ji "Folklorê Kurdî" ya Sadiq Ba-haedîn Amedî, Peyvên Medî di Kurdî de, Balindeyên Kurdistanê, Şalûşapikên Botan, Devoka Liceyê, Kevirtraşî û Avahîyên Mêrdînê, Termînolojîya Pizîşkî, Taybetmendiyên Devoka Goyîyan û herweha Pezxdewîkirin.

Ev hevalên han beşdarî civînê bûn: Salih Akin (Xerzan), Mistefa Aydogan (Mêrdîn), Reşadê Batûyî (Cizîr), Omîdê Mîstefayê Celalî (Bazîd), Lezgînê Çalî (Barzan), Sîdîq Degirmen (Licê), Ehmedê Dirihî (Çewlik), Elîşêr (Wan), M. Selîm Gökçen (Xurs), Newzad Hîrorî (Dihok), Dr Farûq Îsmail (Qamişlo), Hemîd Kiliçasalan (Mêrdîn), Eyûb Kiran (Qerejdax), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozi (Batman), Selam Nûman (Qamişlo), Îsmail Şahîn (Sêmel), Reşo Zilan (Agirî).

Encamên jî xebata civînê li vî jêrê tene pêşkêş kirin.

## Devoka Liceyê

Amadekar: Sidîq DEGIRMEN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilîzî
nawîs; nawisk	yapay taş mağara	grotte artificielle	artificial rock cave
cûm bûn; gut bûn, noq bûn, tê de çûn xwarê	batmak	couler, plonger, faire naufrage	to sink, to be shipwrecked
gît; zîp	badire	épreuve, passe difficile	trial
sawan; çarşefa bastêqan	pestil bezi	drap d'étendage de la mélasse du raisin	big cloth for drying grape pulp
xardos	eğe	lime	file, rasp
çeç; rex, kêlek	yan, yanında, yanındaki	côté	side
xanîyên me li çeç hev in	evlerimiz yanyanadır	nos maisons se côtoient	our houses are next to each other
cebil	bir kullanımlık harç	quantité de mortier pour une application	mortar mixture for just one use
vizîg	loğ mili	axe du rouleau de pierre	shaft of the stone roller
nîgvizîg; nîgtesî, qîçpîpik	çırpı bacaklı	aux jambes grêles	spindle-legged
sifirne	süpürge	balai	broom
çirik	oluk	gouttière	gutter, gutter pipe
kozir; kuzotî, kizot	köz	braise	embers
kître;	kitre	adragante	tragacanth
kirmorî	karınca	fourmi	ant
kirmoriya oriz	kırmızı renkli karınca	fourmis rouge	red ants
xîçek; piçek	azıcık	un peu	a little
meşref; oberî; mêdek	yarma ve bulgur örtüsü	drap d'étendage de boulgour	cloth cover for bulgur and coarsely ground grains (wheat, barley, etc.)
kereşo; kirasso, cilşo	çamaşırıcı	lavandière	washerwoman, laundress
aşbabî; eşbabî; batmîce, çîrr	kurutulmuş kaysı	abricot sec	dried apricots
hencil	incir	figue	fig
dondil	peygamber devesi	mante religieuse	praying mantis
golek; kêzgilolk, gûgerînk, kêzika gûgerîn	bok böceği	bousier	dung beetle
kirnî = qirnî	kene	tique	tick
şal	kadınların omuzlarını örtmek için kullandıkları örtü, şal	châle	shawl
bîçe; pêçe	peçe	voile	veil
babîk; lepşewitî, devşewitî, cimêlî	pekmez ve yağ kaynatılıp kuru ekmeğin parçalarının üzerine dökülerek yenen bir yemek	plat fait avec du raisiné bouilli et du beurre additionné de pain émietté	a dish prepared by boiled grape pulp, butter-and bread crumbs
teftî, savarê hûrik, hûrik, hûrikê savar	ince bulgur	boulgour fin	fine bulgur
kufta binavik, kutilk, kutlik	içli köfte	boulette de boulgour farcie à la viande hachée	balls of bulgur stuffed with meat and then fried
xîşnê bulxurê; xîşan, savara gir, navoşk	iri bulgur	boulgour concassé gros	coarse bulgur
fêlqîk, qatmeya sêgoşe (nivîştîkî), perxaç	küçük üçgen gözleme	petite crêpe en forme de triangle	small triangle-shaped pancake
malêz; poxîn, jajerûn	un ve şeker suyla çalkalanarak tavada kızartılmış tereyağında karıştırılarak yenen bir yemek. Özellikle yeni doğum yapmış annelere verilir.	bouillie à base de farine, de beurre et de sucre, destinée notamment aux parturientes	gruel made of flour, butter and sugar (especially for mothers who have recently given birth)
nikûk; neynûk	tırnak	ongle	nail
maheşek; dasa daran, dehre	dehre, dahra	serpe	a type of sickle for pruning
kurk; gore	çorap	chaussette	sock

lelengî; kuliçe, kuliçe, kuliçe	çörek	petit pain au beurre	bun made with butter
aslanberî; ajneberî	yüzme, çimme	natation	swimming
gerqencika heftnig; kevjal, kèvjale	yengeç	crabe	crab
gorîn; berdêl, berdêlî, pêgork, jinbijin	berdel	mariage croisé d'un homme qui donne sa sœur au frère de son épouse	exchange marriage (where a man gives his sister in marriage to another man in exchange for marrying his sister)
sepelik; sipil, xalxalik, fateresşk	dalak	rate	spleen
weşî; gûşî	salkim	grappe	cluster, bunch of fruit
tîtaleka darê, gupika darê	ağacın tepesi	cime (d'un arbre)	top of the tree
tîtal	1. uzun, uzunboylu; 2. yakışıklı	1. grand, de haute stature ; 2. beau	1. tall; 2. handsome
mişewşî; şorbenîsk	mercimek çorbası	soupe de lentilles	lentil soup
piştâ fatme'eyşo; keskesor	gökkuşağı	arc-en-ciel	rainbow
gorgor; hêlekan	salıncak	balançoire	swing
bîbî : met	hala	tante paternelle	paternal aunt, aunt
nenik; pîrik	nine	grand-mère	grandmother
bamarî; bavmarî	üvey baba	beau-père, époux de la mère	stepfather
qawindên tûyan; tûyên hişkîrî	kurutulmuş dut	mûre séchée	dried blackberry
hewr; 'ewr	bulut	nuage	cloud

## Sadiq Bahaeddîn Amêdî

- IV -

“Folklorê Kurdî”

Amadekar: ELÎŞÊR

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilizî
xilxile	1. taş oyuk; 2. doğal taş yığını	1. cavité rocheuse ; 2. amas de pierre	1. cavity in rock; 2. a pile of stone
mîrgeh	emirlik, emaret, beylik	principauté, émirat	principality
temet; bi qasî, hindî	... kadar	autant-que	as many as, in so for as
mişeqe, mişeq; soldirû, pînedoz, solderz	ayakkabî tamircisi	cordonnier	shoemaker, cobbler
divêl, diwêl, vêl	sırım	lacet, lanière	thong
kor; korik, kort	çukur	trou, fosse	pit, hole, ditch
berhosta	kalfa	contre-maître	foreman
kêrî; zînî	dağ sırtı	crête (de montagne)	crest, peak (of a mountain)
xunsar, xûsar, xwîsar	kırağı	gelée blanche	frost
pengîn, pengiyan, pengivîn, pengihîn, ping bûn, gewimîn, rexinîn	birikmek	s'entasser, s'accumuler, stagner,	to pile up, to accumulate, to stagnate
pengandin, pengivandin, pengihandin, gewimandin, rexinandin	biriktirmek	accumuler, entasser, amasser	to clock up, to hoard, to amass to cause to burst of anger (figuratively)
semer; kurtan, palik	semer	bât	packsaddle
vetezîn	1. sökülme (çadır); mecazi: yere serilmek; 2. silkelenmek	1. se démonter (tente), se défaire ; fig. s'étendre ; 2. être secoué (arbre)	1. to be taken down (a tent), to be knocked down; 2. to be shaken (a tree)
vetezandin	1. sökmek (çadır); mecazi: yere sermek; 2. silkelemek	1. démonter (tente) ; Fig. étendre; 2. secouer, ébranler	1. to take down (a tent); (figuratively) to kill; 2. to shake (a tree)

## Ferhenga pezxwedîkirinê

- III -

Amadekar: Eyûb KIRAN

kurdî	tirkî	fransîzî	îngilizî
av lê (wer)gerîn, av tê wergerîn	çalmak, olgunlaşmaya yüz tutmak (sebze / meyve)	avoir une montée de sève (fruits et légumes)	to have a rise of sap (fruit and vegetables)
bahçîcik; şalik, kelfî	baklagiller kapsülü	cosse	husk (vegetables)
baxvan; baxevan, baxban	bağban	gardien de vignoble	vinyard guard
benkulabe	sambağı	corde de la tige du joug	rope of yoke rod
beran: beranê reza, beranê bîstana, dep	bostan ve bağlarda bitki sıraları	rangée de plantes dans un vignoble ou jardin	rows of plants in a garden or vineyard
bend: nivdîwarê dora baxçe û hewşan	çit	muret de clôture	fence, low wall
hewq	sebze tarlası	champ de légumes, potager	vegetable field
cehê duparsû	iki sıralı arpa	orge plantée à double rangée	barley planted in double rows
cehê çarparsû	dört sıralı arpa	orge plantée par rangées quadruples	barley planted in quadruple rows
cehê şeşparsû	altı sıralı arpa	orge plantée par rangées sextuples	barley planted in six-rows
miskar; serdelav	arktan karıklara suyu bırakma	point de distribution de l'eau vers les rigoles d'irrigation	distribution point of water to irrigation channels
avbir kirin	sulamaya ara vermek	marquer une pause dans l'irrigation	to interrupt irrigation temporarily
cirdî xezal	arap tavşanı ( <i>allactaga euphratica</i> )	gerboise	jerboa
derdiyan	dokunmuş torba vb şeyler	sac tissé	bag or sack made of woven fabric
destî	deste, tutam, bağ	bouquet, gerbe	bunch
ketin beqê; til dan	başaklanma öncesi, gebecik	germer	to germinate
dureh	melez, kırma	hybride	hybrid
durehî	melezlik, kırmalık	hybridité	hybridity
erace; bazar, pîyase	buğday pazarı	marché aux céréales	grain market
binbêjing	kalbur altı	rebut de grains de mauvaise qualité tombés sous le tamis à mailles fines	poor quality grain (that has passed on the sieve)
serbêjing	kalbur üstü	grains de qualité supérieure, restant sur le tamis à mailles fines	better quality grain (that has remained on the sieve)
serserad, kitir	sarat üstünde kalan	rebut de paille et de saletés restés sur le tamis à larges mailles	sieve waste
feld mayîn	sürülmüş tarlada kalan ara kısımlar	rester non cultivé, (portion non labourée d'un champ)	to remain unploughed (a part of a field)
geneg: gula berbiroj	ayçiçeği (Karacadağ yöresinde)	tournesol (parler de Qarajdağ)	sunflower (in the Qarajdağ dialect)

# Balindeyên li Kurdistanê

- I -

Berhevker: Îsmail TAHA ŞAHÎN

Ji ber gelerengîya wan jîngê û wargehên ku di Kurdistanê de hene, ji deşt û çiya û kanî û robar û gerr û golan, Kurdistan bûye cihekî giring bo vehewan û bîvedana gelek teyr û tewalan, balindeyan. Ji ber ku dikevte di navbera komê welatên sar yê jorîya Ewropa û Asiya û komê welatên germên Afrîka û Asiyayê de, bûye rêbara çûn û hatin û mişextbûna gelek cûnên balindeyan. Gelek cûn û rengên balindeyan li çiya û deşt û robar û gerr û golên Kurdistanê, çî bi rêka mişextbûnê ve û çî ji wek xwecih, lê dihêne dîtin.

Piraniya balindeyên Kurdistanê mişext in. Salane, du demsalan, di navbera rojhilat û nîveka Afrîka û Kurdistanê de, hindêk ji serê biharê dihên û serê payîzê bar dikin û hindêk jî berevajî, serê payîzê dihên û destpêka biharê bar dikin. Hejmareke di jî, bi rêbarî, ji destpêka biharê heta nîva wê, ji rojhilat û nîveka Afrîkayê qesta welatên jorîya Kurdistanê û rojhilat û rojavaya Ewropayê dikin. Keteka kêr û qetlazi, ji wan balindeyên biharan qesta Kurdistanê dikin. Ji rojavaya Hindistanê û nîveka Asiya û rojhilata Ewropayê dihên, bihar û havîna xwe li Kurdistanê radiborînin. Piştî çêlikhînanederê, dûmahîya havîne û serê payîzê, careke di vedigerine wan welatên jê hatin.

Hejmara wan balindeyên li Kurdistanê hatîne dîtin, bi qasî 324 balinde ne. Pêkve, ji 16 kom û 57 binemalan pêk hatîne. Koma çûçikan bi tenê, ku mezintirîn kom e, ji 22 binemalan pêk hatîye. Balindeyên jêgotî, li ser sê cûnan dihêne pişk kirin: **xwecih, mişext, rêbar**. Ewên xwecih hemû demên salê dihêne dîtin û cihê xwe bernadin. Mişext, demekî salê, ji serê payîzê û heta dûmahîya biharê, yan ji nîva meha adarê û pê de heta

serê payîzê yan zûtir, bi tenê li cihekê bo çerê yan bo çêlikhînanederê (têjîkînanederê) dimînin. Paşê bar dikine cihekî dî. Rêbar jî, bi tenê rêka çûn û hatina xwe bi cihekê diêxin û lê namînin. Ji balindeyên Kurdistanê 179 mişext in, 65 jê xwecih in û 80 jê rêbar in. Hejmarên borî jî, di paşerojê de, dîr nahête dîtin, zêde bibin yan jî li kêrê bidin. Ev jî li ser guhorîna kardan û serûberê jîngê û wargehê wan radiwestit.

Wek pêştir îşaret hatîye dan, egerê serekî li pişt gelerengî û gelecûnîya balindeyên Kurdistanê, giringîya cihê Kurdistanê bi xwe ye, ku di navbera sê parzemînan (kîşweran) de ye (Asiya, Afrîka, Ewropa). Serbarî cudayîya ax û xak û cihên lê berçav (ji çel, çiya û deşt, gol û robar û kanîyan) û herweha seqayê wê yê hûnik. Ev e hemû hokar in, ku bibite bingeh û hêwirgeha gelek reng û cûnên balindeyan.

Lê di gel wê jî, divêt hizra hindê jî bête kirin, ku vê dûmahîyê, jîn û jiyara gelek ji wan balindeyan berhingarî gefên neman û qirbûnê jî bûye, ku netenahî û xwecihîya rewşa siyasî ya Kurdistanê, yek ji egerên serekî ye. Ev e serbarî xirabkirina war û jîwarê gelek ji balindeyên jêgotî, bi rêka zêdeavakirin û berfirehkirina bajaran, kêşana rêk û rêbarên dirêj di nav cih û wargehên wan de, pişbûn û bêserûberbûna kirasê şînahîya erdî, kêmbûna rêjî û baranan, li hindêk cihên dî, ev e hemû bû egerê nearamî û kêmbûna xwarin û vexwarina hindêk cûnan û vebiryana hindêkên dî.

Herwesa zêdebûna çekê kuştinê, hemû cûnên tifengên otomatîk, pêşkevîna alavên neçîrkirinê, zêdebûna alavên veguhaztinê yê çûnwxweş, wek turimbêlan, ku têkde bûne hokar

bo zêdebûna neçîrkirina serberdayî. Dîsa karanîna dermanên mîşemorkuj ji bo çareserkirina êş û alafên çandinê, zêdekirina ber û berhemê zevîyan, gelek ji wan balindeyan bermirin kirin. Hindêkên di jî, dîrî hilmêtina bêna azadîyê, neçarkirin cihên siruştîyên jîn û jiyara xwe berbidin û ber bi cihên gunçayîtir biçin.

Di bin wan hemû gefan de, pişkeka giring ji xeml û xêz û ciwanîya siruştê Kurdistanê, hate têkdan û ew cih û warên pêştir, balindeyan jîn û jiyareka tena tê de dibewart û hest bi êminahîyê dikirin, neman. Bi vê çendê, nexasim di çavê xemxwer û dilsozan de, bar girantir lê hat û rewş aloztir bû.

## Têbînî:

Ji bo wergirtina navên latîni, mifa ji van jêderan hatîye wergirtin:

1. Beşir el-Lûs: *Et-Tuyûr el-'Îraqîyye*, Metbe'et el-Rabîte), Bexdad -1962, 3 berg, bi erebî
2. Dr. Christopher M. Perrins: *Mewsûnet et-Tuyûr el-Musewewere*, Mektebet Lubnan-Naşîrûn, Lubnan -1997, bi erebî
3. Ehemd Behrî: *Ferhengî Balinde*, Çapxaney Wezareti Perwerde, Hewlêr -2001, bi kurdî
4. Cemşîd Mensûrî: *Perendegani İran*, Neşri Thihne Awîz, Tehran -1379, bi farisî

Ji bo wergirtina navên kurdî, mifa ji van kesan hatîye wergirtin:

- Neçîrvan **Sedîqê Mela Recebê Kiwaşî**, jiyê wî 57 sal in, niha li qezaya Sêmelê xwecih e.
- **Hecî Mistefa Amêdî**, jiyê wî niha di ser 60î re ye, xelkê bajarê Amidiyê ye.
- Neçîrvan **Xelîlê Ehmedê Torî**, xelkê komelgeha Misîrikê, li rojavayî qezaya Sêmelê.
- **Ebdîlxaliq hirorî**, jiyê wî niha di ser 70yî re ye, li bajarê Dihokê xwecih e.
- Feqîr **Şerefê Usîf**, jiyê wî di ser 60ê re ye, xelkê devera Solax e, li rojhilata bajarê Şingalê, gundê Şkefta Şerqî.

kurdî	latîni	tirkî	fransizî	ingilîzî
6. keravî (yê spî), kexxul	<i>Pelecanus onocrotalus</i>	akpelikan	pélican blanc	great white pelican
8. şaqavî, şaq, şihaq, şeşşînk, xel	<i>Ardea cinerea</i>	giri balıkcıl	héron cendré	grey heron
12. garranîk	<i>Ardeola ibis</i>	alaca balıkcıl	héron garde-bœufs	cattle egret
13. xelavîk	<i>Nycticorax nycticorax</i>	gece balıkcılı	bihoreau gris, héron bihoreau	black-crowned night heron
17. legleg	<i>Ciconia ciconia</i>	leylek	cigogne blanche	white stork
21. kelhenek	<i>Geronticus eremita</i>	kelaynak	ibis chauve	northern bald ibis, hermit ibis
27. sûravêlk, sulêvark, soravî, soravêrk, sorave	<i>Tadorna ferruginea</i>	angut kuşu	tadorne casarca	ruddy shelduck
46. korare, kurore, korkorik	<i>Milvus migrans</i>	kara çaylak	milan noir	black kite
49. qurt, kurt, qertel	<i>Gyps fulvus</i>	kızıl akbaba	vautour fauve	griffon vulture
50. dalereş	<i>Aegyptius monachus</i>	kara akbaba	vautour moine	cinereous vulture
51. dalpîroz	<i>Gypaetus barbatus</i>	sakallı akbaba	gypaète barbu	bearded vulture
53. keraşo, şimqar	<i>Circus pygargus</i>	çayır doğanı	busard cendré	montagu's harrier
58. başok, başoke	<i>Accipiter nisus</i>	atmaca, kırgı	épervier d'europe	eurasian sparrowhawk
59. baz	<i>Accipiter gentilis</i>	çakır kuşu	vautour des palombes	northern goshawk
62. dehlesorik	<i>Aquila chrysaetos</i>	kaya kartalı	aigle royal	golden eagle
63. şahbaz, şehbaz, şabaz	<i>Aquila heliaca</i>	şah kartal	aigle imperial	eastern imperial eagle
64. eylo, elih, ilho, elho	<i>Accipitridae sp.</i>	kartal	aigle	eagle
65. dubirak	<i>Hieraetus fasciatus</i>	tavşancıl	aigle de bonelli	bonelli's eagle
66. şahîn	<i>Falco peregrinus</i>	doğan	faucon pèlerin	peregrine falcon
70. teztezok, teşîrêsik, mastmehînk, teşîlok, vetezînk	<i>Falco tinnunculus</i>	kerkenez	faucon crécerelle	common kestrel
74. kewderî	<i>Tetraogallus caspius</i>	ürkeklik	tétraogalle de perse	caspian snowcock
75. kew	<i>Alectoris chukar kurdistanica</i>	keklik	perdrix choukar	chukar partridge, chukar
76. sûsik, kewûsik	<i>Ammoperdix griseogularis</i>	kum kekliği	perdrix si-si	see-see partridge
77. zirsûsik, kerank, qitkurûzok	<i>Coturnix coturnix</i>	bıldırcın	caille des blés	common quail
78. por	<i>Francolinus francolinus</i>	turaç, çil kuşu	francolin noir	black francolin
79. kewê çîr, kewçîr, kewê çûrik	<i>Perdix perdix</i>	çil keklik	perdrix grise	grey partridge
80. tîtav, qerqawil, çor	<i>Phasianus colchicus</i>	sültün	faisan de colchide, faisán à collier, faisán de chasse	common pheasant
81. quling	<i>Grus grus</i>	turna	grue cendrée	common crane
83. mirîşka avî	<i>Rallus aquaticus</i>	su kılavuzu	râle d'eau	water rail
85. qerebeşk	<i>Fulica atra</i>	sakarmeke	foulque macroule	eurasian coot
99. tîtok, tîrîmok, teyirkê mirîyan (ereban, rihan)	<i>Hoplopterus indicus</i>	kızıl ibikli kız kuşu	vanneau indien	red-wattled lapwing
100. pîwî	<i>Vanellus vanellus</i>	kız kuşu	vanneau huppé	northern lapwing
104. tîrlîk, xilxîlok	<i>Charadrius hiaticula</i>	kolyeli büyük yağmurcun	pluvier grand-gravelot	ringed plover
108. mirîşka tiraşan	<i>Scolopax rusticola</i>	avrasya çulluğu	bécasse des bois	eurasian woodcock
109. peyşilk	<i>Tringa (=actitis) hypoleucos</i>	dere düdükünü	chevalier guignette	common sandpiper
130. şehing	<i>Larus canus</i>	küçük gümüş martı	goéland cendré	common gull, mew gull
141. qitik, ketik	<i>Pterocles alchata</i>	kilkuyruk bağırtlak	ganga cata	pin-tailed sandgrouse
143. kevoşînk, kotireşînk	<i>Columba livia</i>	kaya güvercini	pigeon biset	rock dove
145. gapile, rimêle, gapilk, gopile, qurqurk, kurkurk	<i>Columba palumbus</i>	tahtalı, kusuğuk	pigeon ramier	common wood pigeon
150. bîjîyê şirkakê	<i>Clamator glandarius</i>	tepeli guguk	coucou geai	great spotted cuckoo
151. kundê spî	<i>Tyto alba</i>	peçeli baykuş	effraie des clochers	barn owl
152. tok	<i>Otus brucei</i>	çizgili ishak kuşu	petit-duc de bruce	pallid scops owl
161. çevrîk, çivrînk, ebabilk, çivrîk, çengdas	<i>Apus apus</i>	ebabil	martinet noir	common swift
168. qeleşînk, qirhajo, şîşînik, renok (şîngal), fatimok	<i>Coracias garrulus</i>	gökkuzgun	rollier d'europe	european roller
170. kwîk, kilikilî, kwîlkwîl, kwîkê keçel	<i>Picus viridis</i>	yeşil ağaçkakan	picus viridis	european green woodpecker
174. stûbadok, stûmarik	<i>Jynx torquilla</i>	boyunburan	torcol fourmilier	eurasian wryneck
176. wirwîrk, gewranik, kolke	<i>Calandrella rufescens</i>	çorak toygarı	alouette pispolette	lesser short-toed lark
179. gergeri	<i>Lullula arborea</i>	orman toygarı	alouette lulu	woodlark



184. hacîreşk, pêlistank, hehecik, hehecîk, hacîlok, dîlmeqesk, meqesok, dûvmeqesk, dûmeqesk, hachacîlûk, hecîreşk, doşek, dubira	<i>Hirundo rustica</i>	kırlangıç	hirondelle rustique	barn swallow
188. serşihank	<i>Riparia riparia</i>	kum kırlangıcı	hirondelle de rivage	sand martin
190. dûvlerzînk, dûvhejînk, dûvleqînk	<i>Motacilla cinerea</i>	dağ kuyruksallayanı	bergeronnette des ruisseaux	grey wagtail
191. gaçerînk, dûvzelînk, bintilzer	<i>Motacilla flava melanogrisea</i>	sarı kuyruksallayan	bergeronnette printanière	western yellow wagtail
198. bilbilê xurmê	<i>Pycnonotus leucogenys</i>	himalaya bülbülü	bulbul à joues blanches	himalayan bulbul
200. gasire, nikilkure	<i>Lanius excubitor</i>	örümcek kuşu	pie-grièche grise	northern grey shrike, northern shrike
201. cantek, centek, çavreşik, kerregoşik	<i>Lanius minor</i>	kara alınlı örümcek kuşu	pie-grièche à poitrine rose	lesser grey shrike
202. sensor, sensorik, gasore	<i>Lanius senator</i>	kızıl başlı örümcek kuşu	pie-grièche à tête rousse	lanian senator
203. gabelek	<i>Lanius nubicus</i>	alaca örümcek kuşu	pie-grièche masquée	masked shrike
204. meşînek, cîdok, serşînk	<i>Lanius collurio</i>	kızıl sırtlı örümcrk kuşu	pie-grièche écorcheur	red-backed shrike
206. kurrik, kurrikê avê, singkitan	<i>Cinclus cinclus</i>	dere kuşu	cinclé plongeur	white-throated dipper
207. çîrzînk, çîrvînk, bilbilê dehlan, mişkxatûn, bûka mişk, wincika qulan	<i>Troglodytes troglodytes</i>	çit kuşu	troglodyte mignon	eurasian wren
211. gewrêle, gerwêle, gewrîle, mamgewrik	<i>Turdus viscivorus</i>	ökse ardıç kuşu	grive draine	mistle thrush
214. reşêle, reşole, reşêle, reşwêle, reşçêle, reşûle, cîq	<i>Turdus merula</i>	karatavuk	merle noir	common blackbird
215. gulerîk, dûvsorê kevran	<i>Monticola saxatilis</i>	taşkızılı	monticole merle-de-roche	common rock thrush
216. reşwêleyê (reşole) keviran	<i>Monticola solitarius</i>	gök ardıç kuşu	monticole merle-bleu	blue rock thrush
218. belexişk	<i>Oenanthe oenanthe</i>	kuyrukkakan	traquet motteux	northern wheatear, wheatear



6. Keravî (yê spî), kexsul  
*Pelecanus onocrotalus*



8. Şaqavî, şaq, şihaq, şeçeşînk, xel - *Ardea cinerea*



13. Xelavîk  
*Nycticorax nycticorax*



17. Legleg  
*Ciconia ciconia*



21. Kelhenek  
*Geronticus eremita*



27. Sûravêlk, sulêvark, soravî, soravêrk, sorave  
*Tadorna ferruginea*



46. Korare, kurore, korkorik  
*Milvus migrans*



49. Qurt, kurt, qertel  
*Gyps fulvus*



50. Dalereş  
*Aegypius monachus*



51. Dalpîroz  
*Gypaetus barbatus*



53. Keraşo, şimqar  
*Circus pygargus*



58. Başok, başoke  
*Accipiter nisus*



59. Baz  
*Accipiter gentilis*



62. Dehlesorik  
*Aquila chrysaetos*



63. Şahbaz, şehbaz, şabaz  
*Aquila heliaca*



64. Eylo, elih, ilho, elho  
*Accipitridae sp.*



65. Dubirak  
*Hieraetus fasciatus*




66. Şahîn  
*Falco peregrinus*



70. Teztezok, teşîrêsik, mastmehînk, şeşîlok, vetezînk  
*Falco tinnunculus*



74. Kewderî  
*Tetraogallus caspius*



75. Kew  
*Alectoris chukar kurdistanica*




76. Sûsik, kewsûsik  
*Amnoperdix griseogularis*



77. Zirsûsik, kerank, qitkurûzok  
*Coturnix coturnix*



78. Por  
*Francolinus francolinus*



79. Kewê çîr, kewçîr, kewê çûrîk - *Perdix perdix*



80. Tîtav, qerqawil, çor  
*Phasianus colchicus*



81. Quling  
*Grus grus*



83. Mirîşka avî  
*Rallus aquaticus*



85. Qerebeşk  
*Fulica atra*



99. Tîtok, tîrmok, teyîrkê mirîyan (ereban, rihan)  
*Hoplopterus indicus*



100. Pîwî  
*Vanellus vanellus*



104. Tîrlîk, xilxîlok  
*Charadrius hiaticula*



108. Mirîşka tiraşan  
*Scolopax rusticola*



109. Peyşilk  
*Tringa(=actitis) hypoleucos*



130. Şehing  
*Larus canus*



141. Qîtîk, ketîk  
*Pterocles alchata*



143. Kevoşînk, kotîreşînk  
*Columba livia*



145. Gapile, rimêle, gapîlk, go-pîle, qurqurk, kurkurk  
*Columba palumbus*



150. Bîjîyê şîrkakê  
*Clamator glandarius*



151. Kundê spî  
*Tyto alba*




152. Tok  
*Otus brucei*



161. Çevrîk, çîvrînk, ebabîlk, çîvrîk, çengdas  
*Apus apus*





## Hinek peyv ji Selmasê - II -

Amadekar: Khosrow ABDOLLAHÎ

kurdi	tirkî	fransîzî	îngilîzî
avdelîk; girêz (gilêz), şorîk, ava dev avdêlî/avdêrî	salya sulama, sulamacılık	salive travail des personnes chargées de l'arrosage ou de l'irrigation	saliva work of irrigating or watering
avgenî	kokuşmuş su	marais infect	swamp
avir/avirr; awir	bakış	regard	gaze, look
avînk; xunav	şebnem	rosée	dew
avrêj	tuvalet	toilettes	toilet
avro	su yolu, oluk	eau sale de lessive, caniveau	dirty gutter water
avzelik/avzelîk	hidrops	hydropisie	dropsy
avzê/avzêm; zinav	akifer	source de printemps qui se tarit en été	a springtime aquifer that dries up in summer
avzîv	gümüş suyu	argenture	colloidal silver, silver water
avzîv kirin	gümüş suyu ile kaplamak	argenter	to silver plate
avzîvkar	gümüş suyu ile kaplayan	argenteur	silver plater
aware/eware	aylak	errant, vagabond	idler, vagabond
aximandin	depreştirmek, nüksettirmek (yara için)	envenimer, infecter, exacerber	to fester, infect, exacerbate
aximîn (biaxime)	depreşmek, nüksetmek (yara için)	rechuter v.i. (une maladie), s'envenimer, (une blessure), élançer, causer des élançements	to relapse (a disease), to fester (an injury), to cause twinges
axle; xêlîya heyvê	ayla, hale	halo n.m. (autour d'un astre)	halo
axlêvînk; tawe, tawûk	tava	poêle à frire	frying pan, frypan
azirandin	küstûrmek, kızdırmak, yerinden etmek	1. chagriner, peiner, attrister, offenser ; 2. égarer	1. to vex, to annoy; 2. to stray
azirîn	kızmak, çekip gitmek	1. être chagriné, être en colère; 2. s'égarer, disparaître	1. to be vexed, to be angry; 2. to disappear, to be lost
balixî	soyu karışık deve yavrusu	chamelon (non racé), (fig.) bâtard, dégénéré (utilisé surtout pour les enfants)	mixed strain baby camel, (fig.) big bastard
bardan	ketenden örülmüş büyük çuval	grand sac en toile de lin (utilisé pour la laine lors de la tonte)	large canvas bag (use for wool after shearing)
bazîk; pazû	pazı	biceps	biceps
behec	çatlayıp ölmek, çatlama	terreur mortelle, paralysie (par suite de terreur, d'épuisement, de chagrin)	mortal terror, paralysis (as a result of terror, exhaustion, grief)
behecî	ödlek, korkak	poltron(onne)	coward, chicken-hearted
behecîn	çatlamak, çatlayıp ölmek	être terrorisé, être effrayé, crever de chagrin ou de peur	to die of exhaustion or of fear
bel	dik, fırlak, çıkıntılı	dressé, saillant	thick, protruding, salient
bendek (ji bo dar, texte, borî û hwd)	deste, demet, bağ	brassée, fagot	stack, bundle, fagot
berebere; hêdî hêdî	tedricen, peyderpey	progressivement	gradually, step by step, progressively
berkol	çerez	amuse-gueule	appetizers
berkur; berxewik, xexebk, gelpik	çifte gerden	double menton	double chin
berşîv	ikinci kahvaltısı	petite collation servie avant le diner	tiffin, snack served before dinner
beste	paket, ambalaj	colis, paquet	package, pack
besteya postê	posta paketi	colis postal	parcel
besteyek cixare	bir paket sigara	une cartouche de cigarettes	a carton of cigarettes
besteyek kaxez	bir paket kağıt	une ramette de papier	a ream of paper
bestek; besteka nivînan	yatak bohçası	ballot (matelas et couvertures roulés en ballot pour être rangés)	bundle or roll (of blankets or mattresses for storing)



# Li Mêrdînê avahiyên kevirî, naskirina kevir û agahdariyên zanistî

Amadekar: M. Selîm GOKÇEN  
Hemîd KILIÇASLAN

Numûneyên kevirên ku min şandibûn ji beşên avadaniyê ya Zanîngeha Teknikî ya li Stembolê re, di laboratuwarê keresteyên avadaniyê de tahlîla wan hate kirin û agahdariyên li jê nivîsî ji me re hatin şandin.

Ji keresteyên avadaniyê kevirên nerm ku li erdnîgariyê kefirê belav in, di lîteraturê de navên wan *kevirên kilsî* ne. Li Entabê, Ruhayê, Mêrdînê, başûrê Heskîfê, Sûriye û Iraqê ku meriv tim li wan rast tê, xwerû kevirên kilsî ne. Ji %86 CaCO<sub>3</sub> û ji %14 silis in ku ji keresteyên di *tîzavê* de nahilandî ye. Weke di tevaya kevirên xweristê, di wan deverên ku me jimartin de, tevî û rengên wan ji hev cuda ne. Mîna kevirên ku li devera Ruhayê derdikevin ji aliyê rengê xwe ji yên devera Mêrdîn û Midyadê gewrtir in. Kevirên ku li Mêrdîn û Midyadê derdikevin gewrekî û tarîtir in, *çavikên* wan ji pirtir in.

Lêvenerînen di laboratuwarên de hatine kirin, dixwazim bi kurtî pêşkêşî we bikim. Ji taybetmendiyên fîzîkî; li ser *avpizaviya (avmêtîni)* hûrdamarî, di giraniya atmosferê de avpizavî, di ava kelandî de avpizavî hatine test kirin û encamên li jê rêzkirî ji me re hatine şandin.

Li hemberî qerisandinê xwarbûn, *xurumandin* û di giraniya atmosferê de rêjeyên berevaniyê bikêrhatî hatine dîtin. Mebesta min ji ragihandina van agahdariyan ev e: Zîrekbûna bav û bavpîrên me yên ku ji derfetên teknolojîyê bêpar, bêtaybetmendiyên keviran nas bikin, bi hezarên salan bi zelalî li ber çavan radixe.

Kevirên ku bi çavikên hûr bi hev ve ne girêdayine, bayê di çavikan de bernadin, zivistanan germ û havînan ji hênik in. Ev taybetmendîya keviran îro ji alîkariya çavkaniyên enerjîya ku roj bi roj kêmtir dibe, dike. Her weha; havînan ji ber germaya tavê, rûyê keviran yê derve hêdî hêdî disincire, ev germayî di zivistanan de li hundur vedide. Zivistanan avahiyên kevirî ji ber vê yekê germtir in, ango li hev vegereke xwezayî li kar e.

Ji ber piraniya kevir ji kilsa pak e, ji bo tendurustî-laşsaxiyê dijî bakteriyêl e û bikêrhatî ye. Ji ber ev demê dirêj e ku em li Mêrdînê di avahiyên kevirî de dijîn, me divê em wêneyên dema meriv dikeve avahiyêkê bi we re parve bikin.

Avahiyên kevir yê Mêrdînê bi piranî gava meriv tê ber deriyê hewşê yê derve, li ser deriyê derve du lib *mikutkên* ji hesin hene. Ji ber dengê lédana herdu mikutkan ne wek hev in, yek ji bona endamên malê û yê, ya din ji ji bona mêvana ye, ji lédanê dihêlê zanîn ku yê li dergehî dide mêvan e an ji malê ye. Li gora dengê lédana dergehî dema ku lédan ya mêvanan be, hingî yê li malê li gora wê tevdigerin. Dergehên derve bi tevayî ji dara gwîzê yan ji ya tûyê ye. Li şûna menteşeyên îro, li jêra dergehê hêlîneke hesinî û li jorê ji dîsa ji dargwîz yan dar-tûyê ku dibû *zîlana dergeh* dihatê çêkirin. Navê wan *şindeq* û *bindeq* bû. Gava ku meriv diketê hewşê, hêwaneke li gor hêbûna malxwê bi nexşên wek dantêlan ji kevir neqîşkirî an ji *kemberên li saya* derdikeve hemberî merivan. Ev kevirê di nivê kemberê de, li hêla jorin bicîhkirî, kevirê kilitê ye. Li deverê

herî pir kemberên ecemî derdikevin pêşîya me, ku ber bi jor ve *tûjîkî* hatiye hûnandin. Kemberên çapê, di van cûrê kemberan de, li gor hêwan û firehbûna pencereyan temam dibe. Lê cardin ji em li hin berhemên ji dema Selçûqîyan mane rast tîn ku hinekî nizimtir in û ji wan re dibêjin kemberên Bursayê. Dema ku meriv ji hêwanê derbasî hundur dibe du an sê derî derdikevin pêşîya merivan ku bi kemberên girover in û neqîşandî ne û carinan pozîkên giroveriyên wek portaqalan neqîşkirî em lê rast tîn, ew giroverî nişana ku ew avahî çend ode (mezal, jûr) ne dide nişandanê.

Dema ku meriv dikeve hundurê avahiyê, yekser serbanekî bilind bi ber çavê merivan dikeve. Ev ya *musalebe* yan ji *aqd* e. Musalebe ji bo odayên zirav û dirêj in, aqd ji bo odayên çargoşe ne.

**Careke din ji divê hin hûrbîniyên di dîwarên odayan de, werin şîrove kirin:**

**Kulîn:** Bi piranî di orta wê *hêlîna* nivînan de li jorê kevirê neqîşkirî wek dardakirî, wek kevirê kilitê heye. Du mînakên biçûktir li rast û çepê kulîne xuya dikin, yek ji bo balîf, *balgeh-zemberîşan* e û ya din ji bo serrax ango lihêfa ne. Her weha li ba wan malîkên nivînan de *şamdani* ku mêrdînî ji wê re dibêjin *meşme'e* (cihê mûmê), wek kulpikan di dîwarên odayê de nigarkirî ne. Li hundurê odayê di ser pencereyan hin kevirên wek refikan wek 20 cm ji dîwêr zêdekirî hene ku ji bo hilanîna hinarên zivistanî ne.

**Hinargeh:** Dîwar bi tevayî kevirî ne û zikê serban ji sewaxkirî ye. Ev *seyek* (*sewax*) ji nikarê ye ku ji ardê kevir û kilsa neşewitî hatiye tevlihev kirin. Wekî din çî tiştê tev li vê seyekê dikirin baş nayê zanîn. Ji bo pîrsa germkirinê çareser bibe, di orta odeya rûniştinê de, dîsa di kevir de korteke bihostekê kwîr û ne gelekî fireh heye. Piştî komir an êzing ji perengî de ketin bûn agirê arîgirtî, dihanî û dixistin wê kortalê, kursîyêke darîn datanîn ser, bi lihêfeke fireh û mezîn dinuxumandin. Endamên malê ji çarhawîr de lingên xwe dixistin bin lihêfa kursiyê û xwe germ dikirin. Di gelek malan de argûn ji hebûn. Ev argûn wek tifikên malan lê di dîwaran de *hêlînkirî* bûn. Maşê û distan ji argûnan kêmtir nedibûn. Tifik an kuçên êgir bêtir li hewşan bicîhkirî bûn.

Li xaniyên Mêrdînê hin kevir û tiştên kevirnîgariyê ku meriv tim lê rast dihat, yê navên wan dihatin gotin û ku em dizanin, ev in: Nîgarên ango neqşên li keviran bi piranî mêwe (zeytûn, goşiyê tirî, dargerînk, pelên kerengan, pelên mêwên tirî), kevok, xezal û motifên endazyariyê (sêkevî, çarkevî, çargoşe û hwd) li Mêrdînê peyda dibin.

Berî ku diwar bê jenandin bi kevîpîvankê bilindahî û dirêjayîya kevir, ji bo wekhev bin, dihen pîvan.

**Şeh:** Ji bo pîvan û terîşandina kevir, ji hesin çêkirî ye. 10 cm fireh 20 cm dirêj e, orta wî kunkirî ye ku bi doxeke ji dara berûyê doxkirî ye.  
**Rek:** Ji bo dagirtina valayiyên navbera qorê keviran e ku ji kevirên biçûk, xilik û nikarê ye.  
**Kulîn:** Hêlîna nivînan.  
**Hel û şed:** Hosteyiya di dîwarjeniyê de ji bo xetên keviran neyên serhev.  
**Qozîbirr:** (kujîbirr, qorîbirr) Ev kevirên qesp û dirêj û fireh ku hîmên xênî li ser ava dibûn.  
**Qor:** Rêza keviran ya seranserî.  
**Serder:** Serderî.

**Çeprast hûnandina serderan. Kevirên serdera pencereyan:**  
**Kembera kol:** kembera girover e.  
**Kembera ecem:** Kembera tûjîkî ye.  
**Derz:** Wekhevkirin û mîzîna qorên keviran.  
**Derzîn:** derizan, derazîn, derçik, bersivk, asîtan, dergeh.  
**Mezrip, şurik:** Ava barana û ya ji hilandina berfê ku ji serban bê vala kirin, ji keviran rêya avê ye ku zincîrek pê ve dadilqandin da ku dema av ji serban were xwarê belav nebe û derûdora xwe tev şil neke.  
**Muqernes:** Bêtir li avahiyên wekî mîzgeft û medreseyan, di navbera mînber û deriyê derve de, neqş û nîgarên tevlihev yê şewaza kembera bişûnveyî ye. <muqernes: ji yûnanî *kronîs*, ango çemyayî >  
**Curn:** Ji bo destnimêjê, ji bo guvaştina zeytûnan û tirî, ji bo dan û savar kutanê bi kar dihêlê.  
**Pixêrî, bixêrî:** Di ser tifikan re û li ser argûnan, ew kuna di dîwêr de hûnayî, bakêşa dû, dûmanê.  
**Kewar:** Embarên biçûk yê ji herriyê, ji dexl û dan û hûmûrê neliberdestan bi kar dihêlê.  
**Borange(h):** Taqa kevokan, bi tevayî li pêş avahiyê di ser pencereyan re ji bo hewirîna kevokan e.  
**Curnê avê:** Ji bo kevok û çivikan curnên ji kevir di hewşa avahiyên de, li hewşê, li tenhayek ku zûbizû rê pê nakevi de dihêlê bi çih kirin.  
**Qub, qube:** çargoşe, şeşgoşe û heştgoşe ne. Avahiyên girover û sergirtî, bi tevayî li ser mîzgeft, turbe, serê minaran tîn çêkirin.  
**Cax:** Di hundurê odayê de li herdu aliyên derî yê hêla hundurê textebendên ji niv metroyê bilindtir ku balgeh dispartîne.  
**Sincê kevirî:** Sênc û perçînên ji kevir yê li dora nerdiwan û balkonan.

**Hûrbîniyên keviran yê ji derve:** Kevirên derdora dergeh û pencereyan bi piranî neqîşandî ne. Gelek figûr û wêneyên cûrbicûr ku piraniya wan nuha nayên zanîn û xwendin. Ew li dorberên pencere û deriyên nîgarkirî îro ji hene. Keresteyên ku di nîgarkirinê de dihatin bi kar anîn, navên hinan ji wan li jêrê rêzkirî ne:  
**Şablon:** Mestereyên nîgarkirinê  
**Niqor:** Mîngar, miqar.  
**Mîngar:** Miqar, niqor.  
**Taqtoqa:** Çekûç, mîrkut.  
**Nikar:** ardê kevir.

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
hinargeh	kışlık narların muhafaza edildiği yer	niche murale pour la conservation des grenades en hiver	place where pomegranates are stored in winter
şehê keviran	yontma çekici	taillant	chipping hammer (for stone masonry)
rek	taş aralarını blokaj yaparak kireç ve taş tozu ile doldurma, kireç harcı	mortier de chaux	lime mortar
hel û şed	taşların sıra diziminde çizgilerin üst üste gelmeme pozisyonu	appareil, (maçonnerie)	brickwork or stonework
qozîbir	uzunca köşe taşı	pierre d'angle	cornerstone
qor	sıra dizimi	rangée	row
kembera kol	Bursa kemeri	arc de Brousse	Bursa arch, Bursa vault
kembera ecem	acem kemeri	arc persan	persian arch
kembera çap	yarıçap kemeri	voûte en berceau	semi-circular vault
paceya çepûrast	çapraz örülmüş pencere üst kirişi	linteau droit clavé	gauged lintel
derz	derz	jointure, joint	joint, seam
merzîp, şurik	çörten	gouttière	gutters
muqernes	mukarnas	nid d'abeille	honeycomb work
curn	kurna	cuve	basin of a bath or fountain
curnê avê	su kurnası	cuvette à eau	water basin
qub, qube	kubbe, kümbet	coupole	dome, cupola
cax	tahta divan	divan en bois, estrade	low sitting divan
sincê kevirî	taş korkuluk	balustrades en pierre	stone balustrade
şablon	mestereyên nîgarkirinê: nakış şablonu	modèle d'ornement	template of ornamentation
mîngar, miqar, niqor	keski, murç	ciseau plat	chisel
taqtoqa	tokmak, madırğa	maillet	mallet
nikar	taş unu	poussière de taille	fine dust, rock flour





Taqtoqa, minqar, miqar, niqor



Minqar, miqar, niqor



Taqtoqa, minqar, miqar, niqor




Şehê keviran




Şehê keviran




Taqtoqa, çekûç




Qozîbir




Paceya çepûrast




Kembera kol




Kembera çap



Kembera ecem






Muqernes



Qub, qube

### Çend dîmen ji avahiyên Mêrdînê Quelques modèles architecturaux à Mardin A few architectorial patterns in Mardin





# Termsaziya pizişkî bi kurdî - III -

Amadekar: Lezgîne ÇALÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilizî
jiberbirin	çocuk aldırma	avortement	abortion, induced abortion
jiberxwekirin	çocuğunu aldırma	avortement par soi-même	self-induced abortion
jiberçûn: beravêtin	düşük, düşük yapma	fausse couche	miscarriage
sîs	akşın, albin	albinos	albino
sîsî	albinizm	albinisme	albinism
kêm, edav, edab, nê m	irin	pus	pus
kêmxwîn, xwînkêm	kansız, anemik	anémique	anaemic
kêmxwîni, xwînkêmi	kansızlık, anemi	anémie	anaemia
kerr, nebihîsa	sağır	sourd	deaf
kerrî, nebihîsahî	sağırılık	surdité	deafness
kîsê zerdavê, ziravdank	safra kesesi	vésicule biliaire	gall bladder
kor, nebîna	kör	aveugle	blind
korî, korahî, koranî, nebînahî	körlük	cécité	blindness
bînahî	görme gücü	vue	vision, sight
kula guvirandinê (herisê)	ülser, mide ülseri	ulcère d'estomac	peptic ulcer
lîr, lûr	kurdeşen, ürtiker	urticaire	urticaria
spîxwîni, losemi	lösemi, kan kanseri	leucémie	leukemia
bariste	kütle	masse	mass
masûlkhestîkî	kas-iskelet	musculosqueltique	musculoskeletal
neasayî	anormal	anormal	abnormal
bawîfî	romatizma	rhumatisme	rheumatism
belekî	vitiligo	vitiligo	vitiligo
berdêr	verimli, doğurgan, üretken	fertile	fertile
berdêrî	verimlilik, doğurganlık, üretkenlik	fertilité	fertility
berjeng	semptom, belirti	symptôme	symptom
bêxwîni	iskemi, lokalize anemi	ischémie	ischemia
buhujek	çözelti, solüsyon	solution	solution
bişav	süspansiyon	suspension (chimie)	suspension (chemical)
ceribandin	deneme	expérience	experiment
dermanxane	eczane	pharmacie	pharmacy
dermannasî	farmakoloji, eczacılık bilimi	pharmacologie	pharmacology
dermannas	farmakolog, eczacı	pharmacologue	pharmacologist
dildank	perikard, kâlp zarı	péricarde	pericardium
dilkulî	kalp iltihabı, kardit	cardite	carditis
masûlkedil	miyokard, kâlp kası	myocarde	myocardium
masûlkedilkulî	miyokardit, kâlp kası iltihabı	myocardite	myocarditis, myocardial infection
dilnasî	kardioloji	cardiologie	cardiology
dilnas	kardiolog	cardiologue	cardiologist
domdar	kronik	chronique	chronic
dot	kız evlat, kız	fille	daughter
dûnde	evlat, döl	enfant	offspring, child
azmûn	1. deney, deneme; 2. test, sınav	1. expérience ; 2. test	1. experiment; 2. examination, test
azmûni	deneysel	expérimental	experimental
fîloyî	filaryal (hastalığa özgü)	éléphantiasique	elephantic
fîloyîbûn	fil hastalığı	éléphantiasis	elephantiasis
aşikkulî, midekulî	mide iltihabı, gastrit	gastrite	gastritis
gurrîfî	uyuz hastalığı	gale	scabies
guhkulî	kulak iltihabı	otite	otitis
gurçikkulî	böbrek iltihabı	néphrite	nephritis
herisandin (heriskirin), givêrandin, ferikandin	1. sindirmek; 2. sindirme	1. digérer ; digestion	1. to digest; 2. digestion
herisîn, givêrîn, ferikîn	sindirilmek	être digéré	to be digested
givêrker	sindirimi kolaylaştırıcı, hazmettirici	digestif	digestive
hewdan, hewahildan, ragirtin	enfeksiyon	infection	infection
hewdayî, hewahildayî, ragirtî	enfekte olmuş	infecté	infected
jin	kadın	femme	woman
keç	kız	fille	girl
keçel	kalkıran hastalığına yakalanmış, kel	teigneux	affected with tinea capitis
keçelî	kalkıran, kellik	teigne	tinea capitis
kêm, nê m	irin, cerahat	pus	pus
kefse	dizanteri	dyssentéry	dysentery
kotî	cüzamlı, cüzama özgü	lépreux	leperous, leprotic
kotîfî, kotîbûn	cüzam	lèpre	leper, leprosy
kur	oğlan	garçon	boy
lenfgirêk	lenf bezi, lenf yumrusu	ganglion lymphatique	lymph node, Lymphatic gland
lenfkulî, avkênc, kênc, arinc	lenf yumrusu yangısı, lenfadenitis	lymphadénite, inflammation des glandes	lymphadenitis glandula inflammation
marik	kurt, askarit	ascaride	round worm, ascaris
mêr	erkek	homme	man
mîrxîçik, mîrkute, mîkutok	suçiçeği	varicelle	chicken pox
mîzdankulî	mesane iltihabı, sistit	cystite	cystitis
mûkurm	kalkurdu	enterobius vermicularis, oxyure	pinworm



# Eşîra Goyî û taybetmendiye devoka wan a kurmancî

Amadekar: Omîdê Mistefayê CELALÎ

## Pêşek

Riknekî kurdnasiyê jî zaravanasî, devoknasî û nifşnasiya gelê kurd e. Her wiha ji bo ku pêvajoya geşedana zimanê kurdî derkeve holê û kurdiya destpêkî (proto-kurdish) aşkera bibe jî pêwistî bi vî riknî heye.

Em ê di vê gotarê de -li gorî hinek çavkaniyên berdest- konfederasyona eşîrên Goyî û taybetmendiye devoka wan a kurmancî binirxînin û çend agehiyan bi we re parve bikin.

Kovara Hawarê di rûpela yekem a hejmara xwe ya yekem de kurmancên goyî wiha dide naskirin: *"Herwekî xelkê Geliyê Goyan berî çardeh salan, gava tiyare ditin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin. Ji lewre ko ji banî, ji bala difire."* Ji vî hevokê diyar e ku afirîneriya xeyala goyîyan bala Mîr Celadet Bedirxan jî kişandîye û lewre pesna vî afirîneriyê daye. Herwiha bi riya vî hevokê lêkolînên li ser vî devokê jî rûspartine nifşên li pey xwe.

## 1. NASNAME Û WAR

Hinek çavkanî navê "goyî" dispêrin kurdên gutî (Ihsan Colemêrgî) û hinek jî dispêrin peyva "koyî/çiyayî" (Bedel Boselî); lê belê ev agehî bi awayekî zanistî nehatine piştrastkirin. Ev nav ji ku hatibe û ji kîjan peyvê hatibe darijtin jî rastiyek heye ku şûnwarê konfederasyona eşîrên Goyî dikeve navbera deverên Botan û Behdînan. Navenda Goyîyan, Qilabana bi ser Şirnexê ve ye; lê di nava Colemêrg, Sêrt û Wanê de belav bûne. Pareke eşîrê jî li Hewlêr, Zaxo û Sersingê dijî. Ji ber kavilkirin û şewitandina gundên Kurdan bi destê Romê gelek endamên eşîra Goyî derbasî başûrê Kurdistanê bûne û li Wargeha Mexmûrê dijîn. Gelheya eşîrê der û dora sed hezar nefêrî ye û misilmanên şafîî ne.

Di dîroka Kurdistanê de Geliyê Goyan devera yekane ye ku derveyî pergala axatiyê jiyaye û serbixwe heta roja îro hatiye. Bi gotineke din pergala axatiyê tu carî li vî derê bi ser neketiye û axa ji vî deverê derneketine.

Goyî ji du hozan pêk tên û li 33 gundan belav bûne: Derşûvî û Ripinî. Her gundek jî çend tîre û bavikan pêk tê. Ripinî digel baskên xwe hemû li devera Revengan dijiyan û pêşiyên wan Evdalan in. Piştî ku şer û nexweşî dikeve navbera wan her du bavikên Ripinî jî nava eşîrê vedikişin û derbasî devera Ripinê ya îroyîn dibin, li vî derê jî xwe re gundan ava dikin.

*Warên Ripiniyan:* Qilaban, Ripin, Dalokon, Şirîş, Kalgê, Ziravik, Kadîn, Hilal, Şêxan, Sêgirik, Nêrweh e. Beşeke wan jî li bajarokên Kiror û Dêrhînê (Dêra Hînê) dijîn.

*Warên Derşûviyan:* Helet, Kalhesinan, Çeman, Mehrav, Nîreh, Billeh, Şiwêd, Robosk, Bêcih, Mêrgeh e. Beşeke wan jî li bajarokên Kiror û Dêrhînê (Dêra Hînê) dijîn.

Endamên eşîrê heta roja îroyîn jî mêr şal, şapik û tergalê kurdî; jin kiras-kurtik û fistanên kurdî li xwe dikin. Meqamên lîstîkên goyîyan ev in:

- Emer Axa,
- Fatmagê (taybetî goyîyan tenê ye),
- De Gidî (ev lîstîk zêdetir li gundê Dêra Hînê tê lîstin)
- Bavlekan,
- Dugavî,
- Milonê (govenda giran),
- Sêgavî,
- Çep û Rast,
- Şêxanî,
- Hey Sêmêlê (govenda wê bi tevger û rîtmeke bilez tê gerandin).

## Xwarinên wan ên sereke ev in:

- Hilisa (helîse): Ji goşt, doşav û danê kutayî tê çêkirin.
- Kutilka birincê
- Kutilka savar
- Xevis: Ji doşav, ard û rûne malê tê çêkirin.
- Giro: Ji toraq, birinc û doşavê tê çêkirin.
- Kerengmast: Ji kerengên kelandî û mastê avjêkişandî tê çêkirin.
- Hêlizmast: Ji heliz û mastê çikandî tê çêkirin. Hêliz: Çêreyek e ku li zozanan û çiyayên bilind peyda dibe. Ji meha nisanê heta destpêka meha gulane hêşin e û wekî alifê pêz û dewêr jî tê bikaranîn. Çêja wê gelekî tehl û dijwar e.
- Hajî bûg û mandî/mendî.

Tevnkarî jî di nava goyîyan de bi pêş ketiye: Parzûn, xurc û xalîçeyên wan gelekî navdar in.

## 2. ÇEND RÛPEL JI DÎROKA GOYIYAN:

Şerefxan (1543-1603) di Şerefnameyê (1597) de dibêje ku devera Finikê aydî çar eşîrên kurd e û navê eşîra Goyî dikşîne. Li gorî Şerefxanî devera Finikê jî destpêka belavbûna îslamê heta dagirkirina Aqqoyuniyan di destê binemala Mîr Evdal de bûye. Piştî ku herêma bi qasî sed salî di bin zilma Tirkmenên aqqoyunî de zêrezêr dike, gelê herêma biyaniyan ji axa xwe diavêjin û desthilatdariya wan heta nivîsandina Şerefnameyê jî domandiye. Ev rewşa xweser a eşîrê di bin banê Dewleta Osmanî de jî berdewam dike. Sir Mark Sykes -ê ku Peymana Sykes-Picot (16.05.1916) bi navê

wî tê nas kirin- sala 1908an li çend deverên Kurdistanê digere; di gotareke xwe ya derheqa eşîrên heyama osmanî de qala goyîyan jî dike û hejmara wan bi qasî 1400 malbatî destnîşan dike. Herwiha dibêje ku eşîra Goyan canfidayê azadiya xwe ne. Di sedsala 20an de dema ku hêzên Îngilîzan dest bi dagirkirina Îraq û beşeke Kurdistanê dikin eşîra Goyî li hemberî dagirkeran berxwedaneke xurt dide. Mirov dikare bibêje ku berxwedana Kurdan a li Zaxoyê bi eşîra Goyî dest pê dike û di roja 04.04.1919an de generalê îngilîz Alfred Pearson di navbera gundê Bêcih û Mêrgehê de bi destê goyîyekî bi navê Mistoyê Şaho (ji gundê Bêcihê) tê kuştin.

Goyîyan di salên 60î de piştgiriyeke xurt dane Mele Mistefayê Barzanî û agirê Şoreşa 11ê Îlonê geş kirine.

Ew 34 gundiye Roboskiyê yê ku roja 28.12.2012an ji hêla balafirên cengî yê Dewleta Romê ve hatin qetilkirin jî ji eşîra Goyî ne.

## 3. TAYBETMENDIYÊN DEVOKA GOYIYAN

### 3. a. Dengnasî

Di devoka goyîyan de hinek deng ji hin devokên din ên kurmancî cihêtir in.

**3. a. 1.** Dengê [a]yê vediguhere [o]yê. Herwiha ew peyvên ku di piraniya devokan de bi dengê [a]yê dest pê dikin di devoka goyî de bi tu carî wekî dengê [a]yê nayên bi lêv kirin. Bi gelemperî [a] vedigure [o]yê; lê carinan jî bi temamî winda dibe.

bav	bov
av	ov
averê bûn (ji riya sereke derketin)	varê bûn

**3. a. 2.** Dengê [e]yê yê dawiya peyvên her tim vediguhere [a]yê û [e]yên din jî carinan.

me	ma
ez	a (az)

**3. a. 3.** Dengê [b]yê carinan vediguhere [v] û [f]yê û dengê [v]yê jî vediguhere [b]yê.

bi	vi
dehbe (ji "dâbbe"ya erebî)	dahfa

**3. a. 4.** Dengê [r]yê carinan bi temamî winda dibe û carinan kirpandin ji ser radibe.

ser	sa
dev jê berde!	dev jê baada!

**3. a. 5.** Dengê [k]ya dawiya peyvên carinan vediguhere [g]yê û carinan jî [g] vediguhere [k]yê.

hostak/hostayek	hostog
rik/rikoyî	rig/rigawî
bêgavî	bêkovî

**3. a. 6.** Dengê [ê]yê carinan vediguhere [ö]ya almanî û tirkî û carinan jî wekî xwe dimîne.

ê (ango erê)	ö
nesitêle	nastöla
bêcih	böjeh

**3. a. 7.** Ji bilî çend awarteyan qertafa [di-]yê ya lêkerên dema bê bi gelemperî vediguhere [t]yê.

diaxive.	t'oxiva.
dima.	t'mo.

**3. a. 8.** Carinan dengê [o]yê vediguhere [ö]ya almanî û tirkî û carinan jî wekî xwe dimîne..

ode	öde
gûzên Bêcihê ji gûzên gundên din xweştir in.	gözün Böjeh ji gözün gundün dî xwaştir in!

**3. a. 9.** Carinan daçeka [ji]yê vediguhere [ş]yê.

ji xwe re	ş'xwa ra
Yekî ji wan got.	Êk ş'won gweht.

**3. a. 10.** Carinan hinek dengên sivik kirin û vediguherin [y]yê.

tedbîr	teybîr
li hev hatin	leyhotin
li hev ketin	leyketin
leva kirin (pareve kirin)	leyvekiyin

**3. a. 11.** Wekî gelek devokên kurmancî di devoka goyî de jî dengê [ü]yê heye.

bûk	bük
şû	şü
tû	tü
xwîn	xün



3. a. 12. Dengê [h]yê yê ku di gelek devokên kurmançî de winda bûne di kurmançiya goyiyan de maye. Mirov dikare bibêje ku dengê [h]yê xîmekî bingehîn ê peyvsaziya devoka goyî ye.

gotin	gwehtin
birîn, birandin	birihîn, birihandin
çav	çehv

### 3. b. Peyvsazî

3. b. 1. Bi hinek paşgirên kêmnas dariştina peyvên resen

destar	gêrisa (ji gerandin û gêrkirinê)
wêrane	harifta (ji herifînê)

3. b. 2. Bi riya lêkera [kirin]ê cureyekî lêkerên cotlêkerî hatiye afirandin û wateya [karîn, şiyar]ê lê hatiye bar kirin.

ez nikarim.	az nekir kim.
nikarim bêm.	nehat kim.
nerakir kim.	nikarim rakim.
tu dê bikaribî biçî Cizîrê?	tê kir kî biçî Cizîrê?
ev bar giran e, nayê karîn ku bê hilgirtin.	av bor giron e, ne hilgirt kit.
dikarim rakim/nikarim rakim.	rokir kim/narokir kim.

Rovî kirin şivanê mirîşkan,  
rovî rûnişt û girîya...  
Rwîvî kirin şivonî mîrîşkon,  
rwîvî rwînişt î girî...

**Gotin rovî:**  
- Tu ji bo çi digirî?  
**Gwehtin rwîvî:**  
- Ti ji ba çi digirî?

**Got:**  
- Ez şaşika xwe wek Goyîyan girê nadim...!  
**Gweht:**  
- A şoşko xwa wey Göyiyon girênedokim..!

3. b. 3. Bi riya hinek dengên parastî mirov dikare reh û rêçikên hinek peyvan texmîn bike.

şêmîk	şîpîng (şûna piyan a li berê deriyan)
-------	---------------------------------------

3. b. 4. Bi riya guherindina hinek dangan dariştina peyvên kêmnas.

şilijîn/şilijandin (şil û pil bûn/kirin)	şirizîn/şirizondin
--	--------------------

3. b. 5. Bi riya qutkirina dawiya hinek lêkerên bi pêşgira [ve]yê pêkhatî, hinek navdêrên kêmnas hatine dariştin.

veder/vegir (nexweşiya bi riya temas û nefesê digihêje kesekî dîtir)	vadir (ji vedan)
herka avê (riya herikîna avê)	verêj (ji verêjtinê)

3. b. 6. Bi riya paşgirên kurdî ji peyvên biyanî lêkerên kêmnas hatine dariştin.

belaya xwe kirin stûyê yekî, miselet bûyîn	balîştin
--	----------

3. b. 7. Di peyva yekjimar a mê û nêr de tewang nemaye; lêbelê di peyva pirjimar de heye. Herwiha di ravekan de ji ravekerên mê bi [e]yê tîn tewandin.

Azêd got	Ozod gweht.
Zelalê got	Zelal gweht.
Gundiyan digotin	Gundiyon digwehtin.
sivikê malê	sivikî mole

### 3. c. Cureyên Peyvan

#### 3. c. 1. Veqetandek

Di devoka goyî de veqetandeka peyvên mê [o] ye.

mala me	molo ma
cewaba te	cewobo ta

Veqetandeka peyvên nêr [î] ye.

rezê xwe	rezî xwa
xalê me	xolî ma

Veqetandeka peyvên pirjimar [în] e.

mezinên me	mazinîn ma
dengbêjên wan	dengbêjîn wan

#### 3. c. 2. Cînavk

Cînavkên kesane yên yekjimar

ez	(a) az
tu	ti
ew	ew

Cînavkên kesane yên pirjimar

em	am
hûn	hûn
ew	ewon

Cînavkên şanîdanê yên nêzik

ev (yekjimar)	ev
ev (pirjimar)	evon
Cînavkên şanîdanê yên dûr	
ew (yekjimar)	ew
ew (pirjimar)	ewon

### Çend numûneyên alîkar ji bo têgihîştina hevoksaziya devoka goyî

Di her odayekê de nêzikî pênçî mirovî rûniştin.	Ha ödeg da nêzikî penceh mirahv rûniştin.
Tiştêk heye tiştanî	Tiştik heye tiştônî
Bi xwe hewa dikeve ser banî	F'xwe hewo t'kevit sa bonî
Ne pî pê ve ye ne panî.	Ne pî pê ve ye ne pehnî.
Rihberdan hêsan e, lê kurkirin zehmet e.	Rihbadon heson îha, lê kurki rin zehmet a.
Bixwaze ji deriyan, bike sedeqeya seriyan.	Bixoza j'daryon, bike sedeqo saryon.
Evdalan, mala xwe xera kir bi xeyalan.	Evdolon, molo xwa xirov kir v'xe yalon.
Kesê ne li malê, nizane dinya li çi half ye.	Kesî na l'mole, nizonit dinyo l'çi hol a.
Roj diçe, lê bela naçe.	Roj diçit, bes belo noçit.
Cih ji xerîban (biyaniyan) ava nabe.	Ceh j'xeyîvon oxir novit.
Heçî (kesê) li ser destan neçe, qedrê piyan nizane.	Heççî l'sa deston neçit, qedrî piyon nizonit.
Jina pevguherandî (berdêlkirî) her dienire.	Jino peygûharî ha eniriya.

### DOŞAVA MASTÎ

Got, sibehêkê jinikeke qilabanî dê biçûya bêriyê. Hêj neçûyî kurê wê dibêjê ji min re mast bîne. Jinik diçe mastî diîne, kurik dibêje doşavê berde nav, jinik diçe doşavê diîne û berdide nava mastî. Kurik nasekine, dibêje mêt û doşavê ji hev veqetîne. Diya kurikî ji qehran dikevê wî mastî dirijîne ser serê kurê xwe, kurê xwe dihêle, wisa diçe bêriyê. Heta êvarê kurikê biçûk wisa dimîne, çiqas mês û kêşên dinyayê hebin tîn ser serê wî.

### DIFSÎ MOST

Gö, sihorîgi jingîg Qulovî dê çövo bêrî. Hêj neçûyî kurî wi d'bêjîtê ş'mi ra most bîna. Jinig d'çi most t'ênit, kurig d'bêjît difs bikâ nêv, jinig diçit difs t'ênit û diki nêv most. Kurik nohedirî d'bêjît: most û difs jey bikâ, difsî ş'nêv most dâbêxa. Diyo kurik ş'qehron tkevit ew most û difs qepî f'serî kurî xwe da diki, kurî xwa dhilit, weson diçit bêrî. Heto êvorî kurgî kiçik dmênî wason, çen mês î kêşîn dinyoyî tin sa serî wi.

### 4 - Spasî

Di amadekirina vê gotarê de gelek hevalên goyî alîkariya min kirin. Di serî de spasiya kekê Umer Encu û Osman Unver dikim. Spasiyên taybet ji bo berhevkar Seyda Goyan ku gelek zehmetî bi vê nivîsê re kişandin, editoriya vê nivîsarê kir, pirtûkên xwe yên li ser devoka goyî ji min re şandin û beşeke berhema xwe ya ber çapê bi min re pareve kir. Bi rastî berhema wî ya bi navê "Dastanên Kurdî -bi devoka goyî-" şa-hesereke qada xwe ye û hemû berhemên wî ji aliyê Enstituya Kelepura Kurdî (Silê-manî) ve hatine weşandin.

<sup>1</sup> Hawar, sal 1, hejmar 1, 15 Gulan 1932, Çapxaneya Tereqî, Şam.

<sup>2</sup> <http://www.yuksekovahaber.com/yazi/bu-bir-fermandir-2556.htm>

<sup>3</sup> <http://www.bedel-boseli.com/2012/08/goyi-esiretinin-isim-anlam-ve-tarihi.html>

<sup>4</sup> [http://tr.wikipedia.org/wiki/Goyan\\_Aşireti](http://tr.wikipedia.org/wiki/Goyan_Aşireti)

<sup>5</sup> <http://wejeyagoyiyan.blogcu.com/goyan-goyi-asireti/10672828>

<sup>6</sup> [http://ku.wikipedia.org/wiki/Şerefxanê\\_Bedlîsî](http://ku.wikipedia.org/wiki/Şerefxanê_Bedlîsî)

<sup>7</sup> Şerefxanê, Şerefxanê Bedlîsî, Avesta, Stenbol, 2007, r. 245.

<sup>8</sup> The Kurdish Tribes of the Ottoman Empire, Mark Sykes, The Journal of Royal Anthropological Institute of Great Britain and Ireland, Vol. 38, (1908) p. 451- 458.

<sup>9</sup> The Kurdish National Movement: Its Origins and Development, Wadie Jwaideh, Syracuse University Press, New York, 2006, p. 148.

<sup>10</sup> Roboskî-Goyîler, İsmail Beşikçi, <http://www.ilkehaber.com/yazi/robosk-goyler-9466.htm>

<sup>11</sup> <https://www.facebook.com/omurkan73>

<sup>12</sup> <https://www.facebook.com/oso.goyi>

<sup>13</sup> <https://www.facebook.com/misexti>

### Herwiha bnr.

<http://www.bbc.co.uk/remembrance/wall/record/12557>

[http://books.google.com.tr/books?id=FCbspX-dGPYC&pg=PA148&lpg=PA148&dq=goyan+tribe&source=bl&ots=RmH2iXWk8H&sig=Sv\\_I99e1tyMdcAv5RB3vtX6FOoU&hl=en&sa=X&ei=o9mlU73eIMeK0AXMp4DOBO&ved=0CD0Q6AEwBQ#v=onepage&q=goyan%20tribe&f=false](http://books.google.com.tr/books?id=FCbspX-dGPYC&pg=PA148&lpg=PA148&dq=goyan+tribe&source=bl&ots=RmH2iXWk8H&sig=Sv_I99e1tyMdcAv5RB3vtX6FOoU&hl=en&sa=X&ei=o9mlU73eIMeK0AXMp4DOBO&ved=0CD0Q6AEwBQ#v=onepage&q=goyan%20tribe&f=false)

<http://intersci.ss.uci.edu/wiki/eBooks/Articles/1908%20Kurdish%20Tribes%20Sykes.pdf>

[http://www.kaldaya.net/2012/Articles/02/45\\_Feb20\\_AbdulmaseehBoya.html](http://www.kaldaya.net/2012/Articles/02/45_Feb20_AbdulmaseehBoya.html)

# KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE, supplément du Bulletin de liaison et d'information  
© INSTITUT KURDE DE PARIS, 106, rue La Fayette, 75010 Paris - France, Tel. : 00 33 (0)1 48 24 64 64, [www.fikp.org](http://www.fikp.org)  
Directeur de la publication : Reşo ZÎLAN, Réalisation : M. HASSAN